Perpûnkirinên koronayê li Kainuuyê

Perpûnên koronayê ji nesaxiya vîrûsa COVID-19ê dibe sedem diparêze. Bi wergirtina perpûnê xwe û mirovên din diparêzî. Perpûn bêpare tê dayîn.

Perpûnkirinên koronayê li Kainuuyê bi tenê bi wextveqetandinê tên kirin. Wextê dikarin bi hejmara 044 709 37 88ê veqetînin; têlefon di bîrê de dimîne û demek zûtirîn de dîsa têlefona kesî tê kirin. Di hejmarê de bi zimanê înglîzî jî xizmet tê dayîn.

Xalên perpûnkirinê li binkeyên tendiristiyê yên şaredariyan e hem jî li nexweşxaneya navendî a Kainuuyê.

Perpûnkirinên koronayê li du beşan tên kirin, bi navbera 12 hefteyan. Wexta perpûnkirina duyem li cihê perpûnkirinê tê wergirtin yan jî bi têlefonê wext tê veqetandin.

Perpûnkirinên koronayê li herkesê 16 saliya xwe tijîkirî re tên dayîn.

Li hemû perpûnên nû yên li Kainuuyê tên bikaranîn vê gavê îmalatên Pfizer-Biontech yan jî mRNA ya Modernayê ne.

Pirsên di derbarê perpûnên koronayê, perpûnkirinan yan jî pandemiya koronayê dikarin bi rêka emaîlê ji korona@kainuu.fi yê re bişînin (bi inglîzî jî).

Zanyariya zêdetir di derbarê perpûnan de bi zimanên cuda ji malperên Dezgeha tendiristî û halxweşiyê peyda dibin

Finniş | Swediş | Engliş Russian| Estonian| Frenç| Somali | Spaniş | Turkiş| Çinese | Persian | Arabic | Sorani| Albania | Thai | Vietnamese | Slovakian